


NÔRA CEWARÎ Û TEMO

ZINCÎRBENDA

YEKRÊ



BR.KL.72

ÇEMPERA

2

Institut kurde de Paris

Ji zurnavanê Kurdistanê Mihemed Xoşan ra diyarî dikim. (dilovanîya xudê li ser) Yê ku bi çalakî ji bo jîneke hunerîn kar dikir û bi ser bilindî cû aramgehê. Yê ku li ser muzîka wî bi hezareha ji kiç û la-wên bajarê "ZAXO" evîndar û hunerhez dibûn. Mixa bin ku bajarê me bi şîn, xem û girîn hiştîye. Lê evîna wî her dem nava dilê me da dijît.

B. Botani



Tenbûrvanê mezin TEMO û Xanima delal N. CEWARÎ

PÊŞGORTI

(bi kurdiya Botan)

B. Botanî-

Hêjayan!

Bêguman e, ku miletên Kurdistanê bi zargotinê gelekî dewlemend in û nexasm e ji aliyê stran û miqam va. Mixa bin ku ev zargotina henê li welat û bi awayekî baş, rêk-pêkî û wesan bi eskere her nehatîye komkirin û belavkirin. Tev ji ber sitema ku li ser welatê me dibarit. Li ser vê yekê jî dijminên welatê me zargotina me dizînin û ya xo kirine. Wesan roj bi roj têtê ji birkirin, namînit û dimrit. Hema ji ber van ûstan divêt em bi zanistî zargotina xo baş biparêzînin û vejînin. Da ku em jî winda nebîn, ji kevneşopên xo bi dûr nekevînin û li gel zargotina pîroz bi serbilindî bijînin.

Lê em çî bikin?! Dema ku rewşenbîrên me pûte bi vê zargotinê nadin û holê têgehistine ku zargotin di vê demê da ne giring e û bo rewşa îro her bê sûd e.

Bi rastî gerek e em li paşerojê binêrin û li ser wê çaxê bikin. Wesan divêt gêwilê me hebin ku bi erka xo rabînin. Da ku li gor karîna xo moyek ji zargotinê biparêzînin.

Delalan!

Berê zargotin li nik miletên Kurdistanê gelekî giring bû wesan pişkeke mezin bû ji jîna wan ya giran, zehmet û tarî. Lê yên ku

Îro baş têgehîstine ku zargotin pêwîst û giring e, divêt bi xebata parastin û vejandina wê bi hev ra rabin û arîkarîya hev du jî her gav bikin. Hema ji ber van xalan zincîrbenda "YEKRÊ" hatîye meydana çanda kurdî. Wesan hîvîdar in ku hemû çemperên vê zincîrbendê bigehine destên we û bawerîn ku di paşerojê da hêj firehtir bibin. Ew jî li ser me hemyan dimînit, eger em li vê zincîrbendê (weke gulistaneke têhnî, bîrsî, bêkes û bê xudan) bi çavekî bilind binêrîn û baş bizanîn ku deriyê wê bo hemyan vekirîye. Ji lew ra mafê hemyan jî heye ku bêhin bikin û gulên xo jî tê da biçînin. Da ku gulistana me gestir û ciwantir bibit. Mebesta me ew e ku pişikdarbûna we ji bo parastina zargotinê serbilindîya milletên Kurdistanê ye.

Hunerhezan!

Di vê çempera 2-ê da du dostên jêhatî pişikdar bûne. Ya yekê xanim NÛRA CEWARÎ ye. Ya ku li ser parastin, vejandin û belavkirina hunerê dixebitit. Çar belavokên wê jî belav bûne, nivîsarên wê jî hene û li ser vê yekê jî pişikdarîya du çemperên "YEKRÊ" bûye. Wesan ez hîvîdar im ku berhemên wê û yên CEMÎLA CELÎL wergerînim zimanên dî. Da ku Gelên Sovyetistanê û Kurdistanê bi ka-

rên wan serbilind bimînin.

Yê diwê tenbûrvanê mezin TEMO ye. Yê ku bi tinê xo navên welat û milletên me bi zanistî bilind kirine. Ew jî dema ku kasêtekê û sêlikekê tomar kirine. Li ser vê yekê jî ew her dem pişikdarîya ahengan dibit. Wesan jî du belavok bi zimanê ferensî belav kirine. Va ye ez çend stranekê ji devê wî bi deng(note) berhev kirine û hîvîdar im ku her dem li ser xebata hunerîn berdewam bibit.

Dostan!

Dûmahîk, hîvîdar in ku berhema meya belavkirî, milletên Kurdistanê di paşerojê da sêdê jê bibînin. Hema di wê demê da tête gotin, ku me deynên xo dane û bi erka xo jî rabûne. Lê wan rojan gelekî dûr in û tinê evîna me di wê çaxê da dijî. Lê laşên me namînin. Wesan mixa bin, ku ez govend, şahî û henek li gel evîndarên hunerhez li ser vê hunerê û di wê demê da nakim.

Ta belavkirinên dî yên ku ez ji we ra berhev dikim, maç, evîn û silavên germ ji her mirovekî xudan wijdan ra pêşkêş dikim, her bijîn ji bo evîn, aştî û wekhevîyê. Wesan her bijî zargotina Kurdistanê. Da ku miletê wê bimînin û ji bo jîneke kamîranî û ronahî bi serbilindî bijîn.

(A) JI BERHEVKIRINËN N.CEWARÎ-ERMENISTAN

TU ZEYN

Allegretto (♩=104)



tu zeyn tu zeyn tu zey - nê zey - nê - mê



tu zeyn tu zeyn tu zey - nê mel - he - nê

Tu Zeyn, tu Zeyn, lê Zeynê! Zeynebê!

Tu Zeyn, tu Zeyn, lê Zeynê! melhemê!

Baxcê Zeynê kirkirk e, Zeynebê!

Baxcê Zeynê kirkirk e, melhemê!

Kirkirk e girte firke, Zeynebê!

Kirkirk e girte firke, melhemê!

Kondela çirke-çirke, Zeynebê!

Kondela çirke-çirke, melnemê!

Baxcê Zeynê pîvaz e, Zeynebê!

Baxcê Zeynê pîvaz e, melhemê!

Pîvaz e girtî saze, Zeynebê!

Pîvaz e girtî saze, melhemê!

Cot siyara gaze-gaze, Zeynebê!

Cot siyara gaze-gaze, melhemê!

LÊ BI DOTMAMÊ

Allegro (♩ = 152)

The image shows two staves of musical notation. The first staff is a treble clef with a key signature of one flat (B-flat) and a 3/8 time signature. The melody consists of eighth and sixteenth notes. The second staff is a bass clef with the same key signature and time signature. The lyrics are written below the notes.

Lê bi do - ma-mê Lê bê do do - ma-mê
Lê bi do - ma-mê Lê lê bi do - ma-mê

Lê bi domamê lê! Lê bi domamê!
Lê bi domamê lê! Lê bi domamê!

Lê bi domamê lê! Çima? Çima?
Sedkulmalê lê! Çima? Çima?

Çil fincanê lê! Dest hakima
Çil fincanê lê! Dest hakima

Lê bi domamê lê! Dîsa, dîsa
Lê bi domamê lê! Dîsa, dîsa

Sedkulmalê lê, Dîsa, dîsa
Çil fincanê lê! Dest ûrîsa

Çil qeytanê lê! Dora kîsa
Çil qeytanê lê! Dora kîsa

Te li vê bejnê lê! Mame rîsa
Te li vê bejnê lê! Mame rîsa

KULORSORÊ

Allegretto ($\text{♩} = 108$)



ku-lor-so-rê ku-lor-so-rê kulor-so-rê ku-lor-so-rê




wel-ge-ran-di-ne pê me-rê-ka pê du bê-ra

Kulorsorê, Kulorsorê, Kulorsorê, Kulorsorê)2

Kulor kete bin du sêla, Kulorsorê hêra-mêra,
Welgerandine pê merekê, welgerandine pê du bêra

Hey lê Gozê hey lê Gozê! Hey lê Gozê qizqilozê!
Kulor kirine barê Gozê, pirtîya kulor cûye newrozê

Kulor nedane xurtê koça cotî, dane pîrê pozbirnotî
Pêşîya koçê dikişîne, qe talasa pîrê nîne




HEY ZALIM

Allegretto (♩=130)



Hey zalim! Hey zalim! Hey zalim! Zalim! Zalim!
Hey zalim! Kafir! Zalim! Hey zalim! Kafir! zalim!
Koçer im, xirabmal im, koçer im, xirabmal im,
Riyat im, bê pergal im, riyat im, bê pergal im,
derd û kulê te dinalim, derd û kulê te dinalim

Hat kavranê zebeşa, hey zalim! zalim! Zalim!
Hêwirî şove reşa, hey lo lo lo, hey zalim!
Hat kavranê êmişa, hey zalim! Zalim! Zalim!
Te kirime qulpa qayîşa, hey zalim! Zalim! Zalim!
Kirime dayka dergûşa, hey zalim! Zalim! Zalim!



HA ŞILORE

Andantino (♩ = 76)



ha si-lo-re şi-lo-re ku-ro di-no ge-ni-mêbê de-rê, can

Ha şilore, şilore, kuro! Dino! Genimê bêderê wey

Ha şilore, şilore, kuro! Dino! Genimê bêderê can

Biskê tolbaşê, kuro! Gede! Bûne sê kera ha

Biskê tolbaşê, kuro! Gede! Bûne sê kera

Bigrim ramûsim, gede qurba! Van xizênzera ha


Bigrim ramûsim, gede qurba! Van xizênzera wey

Ha şilore, şilore, gede qurba! Genimê şovêyo ha

Ha şilore, şilore, gede qurba! Genimê şovêyo can


Biskê tolbaşê, gede qurba! Bûne sê tişa ha

Biskê tolbaşê, gede qurba! Bûne sê tişa can



KURDISTAN

Moderato (♩ = 86)



We-ten me ra ri huca-ne mi-let he-mû bi-ra-ne

Welatê me Kurdistan e, cî-miskenê me kurdan e,
weten me ra ruh û can e, millet hemû biran e.

Cî-miskenê me kurdan e, temam bax e û bostan e,
weten gul û gulistan e, millet hemû biran e.


Welatê me pir şîrîn e, mêrg û cîmen û zevî ne,
qîz-bûkê wê tev cindî ne, eslê xwe da horî ne.

Kurdistana me zeynet e, cimeta wê pir hurmet e,
temam qedr e û qîmet e, welatê me cinet e.



HOP EREBO

Allegretto (♩=126)



hop E-re-bo hop E-re-bo bar bi çen-dane E-re-bo



bar bi ye-kê ye ye-ka me yekXu-danê mo-bi-re-tê

Hop Erebo! Hop Erebo!

Bar bi çendane Erebo?

- Bar bi yekê ye, yeka me,
yek xudanê mobretê

Hop Erebo! Hop Erebo!

Bar bi çendane Erebo?

Bar bi dudanne, dudê me,
du qewlî mêran e, yeka me,
yek xudanê mobretê

Hop Erebo! Hop Erebo!

Bar bi çendane Erebo?

- Bar bi sisyan e, sisê me,
sê zilfî qaran e, dudê me,
du qewlî mêran e, yeka me,
yek xudanê mobretê

Hop Erebo! Hop Erebo!

Bar bi çendane Erebo?

- Bar bi çaran e, çarê me,
çar taringan e, sisê me,
sê zilfî qaran e, dudê me,
du qewlî mêran e, yeka me,
yek xudanê mobretê

Hop Erebo! Hop Erebo!

Bar bi çendane Erebo?

- Bar bi pêncan e, pêncê me,
pênc barî gan e, çarê me,
çar tarigan e, sisê me,
sê zilfî qaran e, dudê me,
du qewlî mêran e, yeka me,
yek xudanê mobretê

Hop Erebo! Hop Erebo!

Bar bi çendane Erebo?

- Bar bi şeşan e, şeşê me,
şeş devî şûran e, pêncê me,
pênc barî gan e, çarê me,
çar taringan e, sisê me,
sê zilfî qaran e, dudê me,
du qewlî mêran e, yeka me,
yek xudanê mobretê

Hop Erebo! Hop Erebo!

Bar bi çendane Erebo?

- Bar bi heftan e, heftê me,
heft belgî betan e, şeşê me,
şeş devî şûran e, pêncê me,
pênc barî gan e, çarê me,
çar tarîngan e, sisê me,
sê zilfî qaran e, dudê me,
du qewlî mêran e, yeka me,
yek xudanê mobretan e

Hop Erebo! Hop Erebo!

Bar bi çendan e Erebo?

- Bar bi heştan e, heştê me,
heşt qalkî kûsyan e, heftê me,
heft belgî betan e, şeşê me,
şeş devî şûran e, pêncê me,
pênc barî gan e, çarê me,
çar tarîngan e, sisê me,
sê zilfî qaran e, dūdê me,
dû qewlî mêran e, yeka me,
yek xudanê mobretê

Hop Erebo! Hop Erebo!

Bar bi çendane Erebo?

- Bar bi nehan e, nehê me,
neh serî meran e, heştê me,

heşt qalkî kûsan e, heftê me,
heft belgî betan e, şeşê me,
şeş devî şûran e, pêncê me,
pênc barî gan e, çarê me,
çar tarîngan e, sisê me,
sê zilfî qaran e, dudê me,
dû qewlî mêran e, yeka me,
yek xudanê mobretê

Hop Erebo! Hop Erebo!

Bar bi çendaneê Erebo?

- Bar bi dehan e, dehê me,
deh tizbîyê kalan e, nehê me,
neh serî meran e, heştê me,
heşt qalkî kûsan e, heftê me,
heft belgî betan e, şeşê me,
şeş devî şûran e, pêncê me,
pênc barî gan e, çarê me,
çar tarîngan e, sisê me,
sê zilfî qaran e, dudê me,
du qewlî mêran e, yeka me,
yek xudanê mobretê

HESENÎKO (MIQAM)




Allegretto ($\text{♩} = 104$)

Musical score for HESENÎKO (MIQAM) in G major, 2/4 time. The piece is marked Allegretto with a tempo of 104 beats per minute. The score consists of seven staves of music. The first staff begins with a treble clef, a key signature of one sharp (F#), and a 2/4 time signature. The melody is characterized by eighth and sixteenth notes, often beamed together. The second staff features a triplet of eighth notes. The third staff continues the melodic line with various rhythmic patterns. The fourth and fifth staves show more complex rhythmic figures, including sixteenth-note runs. The sixth staff has a triplet of eighth notes. The seventh staff concludes the piece with a final cadence.

MIQAM

Allegro ($\text{♩} = 136$)

Musical score for MIQAM in G major, 2/4 time. The piece is marked Allegro with a tempo of 136 beats per minute. The score consists of two staves of music. The first staff begins with a treble clef, a key signature of one sharp (F#), and a 2/4 time signature. The melody is characterized by eighth and sixteenth notes, often beamed together. The second staff continues the melodic line with various rhythmic patterns, including a triplet of eighth notes. The piece concludes with a final cadence.



Tenbûr- çêkirina TEMO



(B) JI BERHEVKIRINËN Î.TEMO-MEHABAD 1975

Dengnivîs: B.Botanî

WESÊ

muzîk

stran

lê lê We - sê lê lê lê

We - sî - la - yê wey wey

lê lê We - sê lê lê lê

We - sî - la - yê wey wey

Hey lê Wesê lêlêlê Wesîlayê wey wey)2
 Te porsorê lêlêlê l' hine dayê wey wey)2
 Teşîrêse lêlêlê çû serayê wey wey)2

Mala Wesê lêlêlê j' mala wê da wey wey)2
 Qirka Wesê lêlêlê çil gazê da wey wey)2
 Ez radmûsim lêlêlê d' mal babê da wey wey)2

Mala Wesê lêlêlê l' taqa jorî wey wey)2
 Qirka Wesê lêlê mircan û morî wey wey)2
 Ez ramûsim lêlêlê kiçka torî wey wey)2


WERNÊ



Dê wer - nê Wer-nê wer-nê



dê wer - nê wer- nê wer-nê



dê wer - nê wer-nê wer-nê



meş - in go - ven- dê dil-ber



meş - in dî - la - nê es -mer

Dê wernê wernê wernê!

Dê wernê wernê wernê! (A)

Dê wernê wernê wernê!

Mesin govendê dilber, (B)

Mesin dîlanê esmer (C)

Esmera b' gewra nadim (A),(B),(C)

Terka çavê reş nadim -"-

Va gewra l' va` esmera -"-

Govend gerya l' bêndera -"-

Rakin pêş malka zera -"-

Govenda min mezin e - "- -
Jê derket cotek jin e - "- -
Hine l' dest û bazin e - "- -

Govenda min biçûk e - "- -
Jê derket cotek bûk e - "- -
Hine l' dest û neynûk e - "- -

KINÊ





wey lê Ki - nê lê lê lê



ma - la mi - nê way way

Wey lê Kinê! Lêlê mala minê! Way way)3

Ez ne kin im lêlê ne kurtik im way way
Tak rihana lêlê pir hûrik im way way
Hişê lawa lêlê sivik dikim way way

Ez ne kin im lêlê ne dirêj im way way
Tak rihana lêlê tim pîrbêj im way way
Hişê lawa lêlê digrim, tavêjim way way



TEMERO

Pê da pê da


Te - me - ro pê da

Pêda, pêda lo! Temero! Pêda
 Nece Zaxokê lo! Neyarî d' rê da
 s^hûr û lo l' taqa qesrê da

Spî ye, spî ye lo! Bagokê spî ye
Malwêranê çandî lo! Şitlê vav kundîya
Bersivek hatîye lo! Temerî mirîye

Reş e, reş lo! Bagokê reş e
Malwêranê çandî lo! Şitlê van zebeşa
Bersivek hatîye lo! Temerî nexweş e

Sor e, sor e lo! Bagokê sor e
Malwêranê çandî lo! Şitlê van gundora
Bersivek hatîye lo! Temerî zor e




Kevance- çêkirina TEMO


SARÉ



Sa - rê tu Sa - ra mi - nî lê



ca - nê tu ka - ra mi - nî



Sa - rê tu Sa - ra mi - nî lê




ca-nê tu ka - ra mi - nî

(Sarê! Tu Sara min î
Lê canê! Lê canê! Tu kara min î)2

(Sarê! Rabe êvar e
Lê canê! Rabe êvar e)2
(Sihê girtî dîwar e
Lê sih daketî zinar e)2
(Kes l' gundê me tine
lê j' bilî me dost û yar e)2

(Sarê hat û digirda
Lê canê hat û digirda)2
(Mi d'xwest Sarê ramûsim,
lê dê-babê wê li cem da)2
(Ew jî dixwest baxivit lo
tirkî-mirkî xeber da)2





Tenbûrik- çêkirina TEMO




LÊXISTINOK

girê sîra, kevokê û Kinê







JI TOMARKIRINÊN T E M O

1- KASÊT



TEMO



**DU
KURDISTAN**

2- SÊLIK

TEMO

BARDE DU KURDISTAN
la tradition et lexil



radio france

DISTRIBUTION EXCLUSIVE
MUSIDISC EUROPE

★ Eger ji zargotina(folklor)kurdî her tenê stran bimane, cihanê bigota,ku gelê kurd gelekî aqilmend, zîrek û jêhatîye.

Xelîl Çaçan Mûradov-Ermenistan
(dilovaniya Xudê li ser)

★ Eger ji îro bi sûn da em guh nedin folklor a xwe(her texlît fen û hunerên gelêr) wê winda bibe û here.

Nûredîn Zaza-Swîsra

★ Folklor a her gelekî hêza wî ya hunermendiyê ye. Kûrayî û firebûna giyana wî gelî bi ber çava tîne.

Nûra Cewarî-Ermenistan

★ Ez bê strana kurdî ne kurd im.

Cotkarekî kurd-Zaxo, Kurdistan
(di sala 1965 da notsalî bû)

★ Pûtepêdan bi çanda folklorî pêşxistina
çanda nû ye. Ji ber ku pêşxistin tenê li
li ser folklorê dimîne û ji bingehen wê
tên. Wisan ne pêşxistin e bê folklor û
ne çanda nû bê xebata folklorî.

Beşîr Botanî-Swêd

kovara "MUZÎK Û HINER" ê
BIXWÎNE! BELAV BIKE! PÛTE PÊ BIDE!
ji bo arîkarîyê:- postgirokonto 453 46 47-5
Bashir Botani, SWEDEN.



F E R H E N G O K


Zargotin	: folklor
Rêkpêk	: mureteb
Sitem	: zilm
Ûşt	: hoy, sebab
Kevneşop	: adat û teqalîd
Pûte	: îhtîmam
Sûd	: feyde
Paşeroj	: musteqbel
Hizir	: fikir
Gêwil	: zewq
Biparêzin	: xilas kin
Zincîrbend	: muselsele (bo program û belavoka)
Çemper	: heleqe (pişik, beş)
Mebest	: meqsed
Berhem	: întac
Sêlik	: plak, îstîwane
Tomar	: tescîl (tijîkirina stranan)
Aheng	: hefle, party
Deng	: note (muzîk bi deng tê nivîsandin)
Dûmahîk	: dawî
Erk	: wezîfe, kar û bar
Wekhevî	: musawat
Aramgeh	: (gor cihê rahet û paldanê ye)
Xal	: niqte
Dibit	: dibe, wesana dikit: dike, (bi kurmanciya Kurdistana Îraqê, Îranê û Cizîra Bo- tan (başûra Kurdistana Tirkîyê)).

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE DE PARIS
BIBLIOTHÈQUE
RÉSERVE

78
TEM

INSTITUT KURDE DE PARIS
ENTRÉE N° 1596



ji belavkirinên kovara "MUZÎK Û HINER"ê

MAFÊ ÇAPKIRINÊ HEYE

1 9 8 2
S W Ê D